# Zaniyariyên li bara tendirustiya FlüGe

## Li bara me

Em lêkolînerên zanîngeha Bîle Fîldê ne. Em bi alîkariya hev ji bo baştirkirina rewşa tendirustiya penaberên li Almanyayê di demên dirêj de xebatê dikin. Em ji bo vê yekê hin lêkolînan dikin û dixwazin li bara tendirustiya we hin pirsan ji we bikin. Ev lêkolîn bi raypirsiyan dest pê dike û piştre hevpeyvîn tên kirin. Mijara van lêkolînan wek mînak bi awayê taybet li bara tendirustiya we ya derûnî û pêwîstiyên tendirustiya we ye. Ev lêkolîn di bin serperiştiya Dr. Eliksandir Kermer de pêk tên.

## Çima lêkolîna me girîng e

Rewşa we ya li welatê we yê sereke, li dema penaberiyê û her wiha li welatê Almanyayê dibe ku li ser tendirustiya we ya cismî û derûnê bandorê bike. Ji ber vê yekê, em dixwazin li bara tendirustiya we ya niha hin pirsan bikin. Ji bo vê yekê em dixwazim bizanin ku tiştîên ku ji bo tendirustiya we girîng in, çi ne. Em ê her wiha hin pirsan jî li bara kesên derdora we (malbat û heval)li we bikin. Encamên lêkolînê yê radesrtî zanist, siyaset û raya giştî bê kirin. Em ji bo çakkirina tedawiyê bijîşkî yê li penaberan, pêşniyaran dikin ku wek mînak siyasetmedar bikarin tê de hin guherînan çêkin. Ji bo vê yekê pêwîstiya me bi alîkariya we heye.

## Em dixwazin pirsên xwe ji kê bikin

Em ji bo lêkolîna xwe li bara tendirustiyê i pey jin û mêrên ku ji 18 salan zêdetir penaber bûne, digerin. Em bi zimanên erebî, farisîm kurmancî, îngilîzî û almanî diaxivin.

## Pêvajoya raypirsiya destpêkê

Em dixwazin li bara tendirustiya we û derdorên we bizanin. Ji ber vê yekê em dixwazin bi zimanê we yê zikmakî pirsan li we bikin. Ev raypirsiya destpêkê bi qasî 60 xulekan dem dibe.

Di raypirsiyê de di warên jêrê de pirs tên kirin:

- Zaniyariyên we yên taybet (wek temen û zayenda we)
- Mijara penaberiyêm
- Tendirustî, nexweşî û ziyan

- Derfetên bijîşkî
- Pêwîstî
- Rewşa jiyanê
- Awayê jiyanê (wek kişandina cixarê, vexwarina alkolê)
- Tendirustiya derûnê
- Malbat û heval

Em ê ji bilî vê raypirsiyê, giranî, bejn, dora kember û hêtan, tansiyon û rehjena te jî bipîvin. Her wiha em ê daxwaz bikin ku nimûneyê xîtika bêvilê ji te bê girtin. Ev nimûnegirtin ji bo nirxandina hin bakteriyan ji hêla jîngehî ve tê kirin û biryar e ku bi taybet vê mijarê zelal bikî ku gelo jiyana li cihên komkî bandorê li adaptebûna bakteriyan dike yan na. Ev yek bi taybetiyên te yên jenetîkî nayên komkirin. Nimûne dê piştî nirxandinan bên jinavbirin. Wekî din lênêrînên bedenî bi awayê xwebexş tên kirin. Tu di her kêliyekê de dikarî bêyî ku sedemên xe bibêjî û bêyî ku ji te re ti ziyanek hebe, dawiyê li lênêrînan bînî.

## Hevpeyvînên zêdetir

Piştî raypirsiya destpêkê, wê gelek hevpeyvînên din di mehên pêş de bên kirin ku yê li ser raypirsiya destpêkê hûr bin. Piştre agahiyên raypirsiyê yê ji hêla Navenda Hevahengiyê ve bi agahiyên raypirsiya destpêkê ve bên rêkkirin. Di encama vê yekê de, diyarkirina vê yekê ku te çi agahî dane, wê ji hêla Navenda Hevahengiyê ve nemumkin be. Ji ber vê yekê heke em paşê dubare bixwazin bi te re têkevin têkiliyê û raypirsiyên din li te bidin nasandin, em ê pir kêfxweş bin.

## Zelalkirin û parastina agahiyan

Heke tu bixwazî beşdarî vê lêkolînê bibî, divê bi awayê nivîskî razîbûna xwe ragihînî. Beşdarbûna di lêkolînê de xwebexşane ye. Heke tu bixwazî bersiva hin pirsan nedî, yan raypirsiyê bidî sekinandin, dikarî di her kêliyê de vî karî bikî. Ev kar ti ziyanekê nagihîne te. Heke tu bixwazî raypirsiyê bi dawî bikî, yan bixwazî agahiyên te bên jêbirin, dikarî vî karî bi riya jimareya telefon yan jî e-nameya ku hatiye ragihandin, ji Navenda Hevahengiyê ya kolecê re bibêjî.

Ji bo ku tu di pêşerojê de ji bo raypirsiyên din jî bêyî vexwendin, pêwîstiya me bi e-name û hejmara telefona te heye. Ev agahiyên şexsî, tenê bi awayê demkî û di çarçoveya vê lêkolînê de tên qeydkirin û wê piştî raypirsiya herî dawîn, bên jêbirin. Agahiyên te radestî ti kesî nayên kirin. Hemû agahiyên li bara tendisutiya te wê cidayî agahiyên têkiliyê bên qeydkirin.

Agahiyên te yên trendirustiyê yê bi navê kod bên qeydkirin, yanê bi li Navenda Hevahengiyê yê bi kodekê bên qeydkirin. Lîsteyeke assignmentê heye ku bi riya wê agahiyên ku di dema raypirsiyê de

hatine komkirin, li lîsteya her kesî bên zêdekirin. Tenê Navenda Hevahengiyê ku erka wê prastina agahiyan e, dikare xwe bigihîne van agahiyan. Helbet kesên ku agahiyan dinirxînin, nikarin xwe bigihînin agahiyan. Bi vî awayî nirxandina agahiyan di qalibê navê kod de tê kirin. Ez dikarim agahiyên zêdetir li bara parastina agahiyên şexsî û qeydkirina agahiyan, di her kêliyê de di projeya parastina agahiyên vê lêkolînê de di malpeya kolecê de (www.uni-bielefeld.de/fluege/gesundheitsstudie) bibînim.

Agahiyên raypirsiya destpêkê, divê bi agahiyên hevpeyvînan re bên girêdan. Helbet em ê ji bo hevpeyvîn û pevgirêdana pilankirî ya agahiyan, belgenameyeke din a razîbûnê ji te wergirin.

## Agahiyên têkiliyê

Em ji bo pirsên zêdetir di xizmeta te de ne! Ji kerema xwe bi me re bikeve têkiliyê:

Telefon: 0521 106-3879
Bi riya e-nameyê: fluege@uni-bielefeld.de

Ji bo agahiyên zêdetir serdana melpera projeyê bike:
http://www.uni-bielefeld.de/fluege/gesundheitsstudie